

## **Thurîngen bike cîhê hevgirtîyê û domdar.**

### **Bingehên jiyânê ewle bikin**

Em yek Thurîngenê kû di nav de hevrêziya civakî heye, di nav de edalet heye, di nav de mirov xwe di ewlehîyê de hîs dikin, dixwazin. Ev pisûla (rênişana) me ye û hukumeta Bodo Ramelow vî welatî wisa birêva bir (îdare kir). Em dixwazin di pêşerojê de ji vî welatî ji bo berjewendiyên hemû însanan wisa îdare bikin.

Li Jena, Erfurt û Weimarê kîrêyên xaniyan zêde dibin, ji bo însanan cîhên runiştinê kêr dibin. Ji ber vê yekê em pênc salan di van bajaran de **kîrêyên xaniyan** didin sekinandinê û ji bo çêkirina xaniyên kû kîrêya wan erzane budçeyê xurt dikin. Wekî din, em ji bo vê heremê (eyaletê) komeleyekê çêkirina xaniyan ya taybet kû di heman demê de di hemû Almanayê de **li anegorî însanên temen dirêj (extîyar) veguherîna xaniyan** pêşve bibe, ava dikin

Em hemû **dibistanan** - di nêzikê malan de û bi hevra girêdayî dihêlin. Bi vî awayî em ji bo hemû zarokên kû derveyî bajaran de dijin perwerdebûnekê baş ji ewle dikin. Ji bo perwerdebûnekê baş, hê berîya dibistanê ji em **pêşdibistanan (Hêlînên Zarokan)** yên hemû bêpere (bedava) pêk tînin û ji bo ciwanên xwe kalîteya lînehêrînê yê baştir pêk tînin.

**Em ji derî ji derî tevgerdarî** pêk tînin. Ji bo vê armancê, em girêdanekê bi trêna, otobus, tramvay, lê belê di heman demê de girêdanekê bi taksî, otomobîl - û parvekirina bîsîklêtê otobusên – bi bang kirinê (telefon) û ji bo girêdana veguhastinê (trafîkê) ya ji bo Thurîngenê karûbarên rêwîtiyê pêk tînin. Di heman demê de em ji bo klîmaya (avhewayê) bêteref (notral) pengavan teşwîq dikin.

Em **karûbarên (xizmetên) tenduristiyê** kû bi taybetî hewcedariyên nifûsa kû pîr dibe, bi cîh tîne, xurt dikin. Ji bo vê armancê, emê nexweşxaneyên kû nêzikî cîhên runiştinê ne, lînehêrîna li ser lingan û derman kirina ji bo însanên temen dirêj (kal-pîr), bi hevra girêdidin.

Di rewşa nexweşî û pîrbûnê de emê **lînehêrînek baş** li Thurîngenê bikin tiştekekê wisa kû wek normal hatîye qebûl kirin. Ji bo vê armancê, em hewl bidin kû di nexweşxaneyan de bêtir xebatkarên hemşîreyê (lînehêrînê) werin xebitandin û di karûbarê lînehêrîna însanên temen dirêj (pîr –kal) de mûçeyekê baş were danîn. Ew hem ji bo nexweşên zilam û nexweşên jin û her weha ji bo karmendan jî baş e.

Li Thurîngenê Aborî geş dibe û bêkarî kêr dibe. Emê li ser vê riyê bidomînin. Lê belê Almanên Rojhilat, tevî runiştwanên zilam yên Thurîngenê û runiştwanên jin yên Thurîngenê îro 30 sal piştî dîsa yekîtîyê, di warê teqawitbûne de, di warê mûçe girtinê de, di warê wergirtina erkên serokatîyê di karên kargêriyê de, hîn ji tîne neçar kirinê. Pêdive kû edî tiştên wisa bi dawî werin. Emê ji bo kû li Thurîngenê mirov bikaribin bi mûçeya xwe bijîn tekoşîna xwe berdewam bikin. Em ji bo pêngavên guncan li ser disekinin **da kû pereyên teqawidîyê û mûçeyên xebatkaran bigihîjin li anegorî astê Almanaya Rojavayê û em tekoşin didin kû zêdetir Almanên Rojhilatî di karên kargêriyê erkên serokatîyê di werbigrin.**

Û ji bo însanên kû hewcedariya wan piştgiriya civakê heye, em ji bo wan di projeyekê modelê de formekekê nû yê ewlehiya bingehîn a civakî diceribînin.

**Daristanê Thurîngenê** demarekê kesk ya jîyanê ya runiştwanên Thurîngenê ye û ji bo me xezîneyekê ekolojîk ya herî hêja ye. Zîrarên kû ji ber ne barandina baranê û mêş û moran pêk hatine, emê wan di demekê nêzik de ji ortê rakin. Ji bo vê yekê em bernameyekê mezin yê dîsa saz kirina daristanê (dar lê danîn) pêk tînin.

Em **bingehên xwezayî yên jîyanê** diparêzin, çandinîya gundîyan diparêzin û em ji bo aborîya domdar piştgirîyê didin hewildanên cotkaran. Em spekulasyonên bi ersê û erdê re qedexe dikin.

Dabînkare (garantorê) vê polîtîkayê **Serokwezîr Bodo Ramelow** e. Hukûmetekê kû bi serokatîya Bodo Ramelow were rêvabirinê pêgirî dike ku sîyaset li Thurîngenê berdewamî yek jîyanekê kû bi hevkarî û ewlehiyê tê karakter kirin, were pêk hatin.

Hûn, runiştwanên zîlam yên Thûrîngenê yên delal û runiştwanên jin yên Thûrîngenê yên delal, di destê we da ye kû em bikaribin bi vî rengî bidomînin: **bi dengên (rêyên) xwe yê yekem û yê duyemîn ji bo hilbijartina parlamentoya eyaletê (heremî) ya 27ê cotmeha 2019 an, ji bo die LINKE (Partîya Çep)**